



Rheinland-Pfalz

LANDESAMT FÜR SOZIALES,
JUGEND UND VERSORGUNG

ÇAVDÊRÎYA YASAYÎ

Di gel şirovekirina bo Nûnertiya Xemxwariyê



PÊZANÎN BO KOÇBERAN

Redaktion

AG Broschüren der LAG BtG Rheinland-Pfalz
Landesamt für Soziales, Jugend und Versorgung
– Überörtliche Betreuungsbehörde Rheinland-Pfalz –
Rheinallee 97–101 • 55118 Mainz

Telefon 06131 967-260
www.lsjv.rlp.de

Peymangeha ji bo çavdêriya yasayî ya navçandî hizra vê belavokê da.
Ev deq bo gelek zimanan hatiye wergerandin.



Institut für
transkulturelle
Betreuung
(Betreuungsverein) e.V.

Freundallee 25 • 30173 Hannover • Telefon 0511 590 920-0 • www.itb-ev.de

XWENDEVANA/Ê XWEŞTIVÎ,



yasaya çavdêriyê ji bo parastinê ye, lê bo piştgiriya mirovên mezin e jî, bi sedema nexweşiyê derûnî an seqetiyê leşî, hişî û giyan rewşa xwe bi temamî an parçeyek jê nema dikare xwe bi xwe tev bidêre û ji ber wê yekê pêdivî bi alîkariya hinek mirovên din heye. Xisletiya çavdêriyê bi wê ve bende, ko mirovên pêdivî alîkariyê ne, piştevanîyê ji hêla çavdêrvanekî ve werdigirin, ew yên karûbarên wan, li gor daxwazên yasayî yên bo wan destnîşankirî di çarçoveya erkên yasayî çareser dikin. Pêdivî ye daxwaz û xweşiya mirovên têkildar di meqamê sereke de be.

Li Rheinland-Pfalz gelek mirov ji welatên cuda cuda ji vê cîhanê dijîn. Ji bo penaberên nêr û mê jî pêdiviyê pêzanîn- û piştevanîyên baş yên têne pêşkêşkirinê hebin. Hun şêwirmendî û alîkariyên tên pêşkêşkirinê yên ji cihên pispor û navendên perwerdehiyê zor caran nas nakin an jî zehmetiyê dibînin di zimanên bi fermanberan re û hun nizanin, ka hun ê biçin ba kîjanî.

Ev berhevoka pêzanînan bersiva pirsên praktîk yên çavdêriya yasayî, ji bo çavdêriya berdest û nûnertiya xemxwariyê li Elmaniya û bi gelek zimanan dide, dako koçber rehberê bi zimanê dayîka xwe hebin. Zêdebarî vê jî di vê rehberê de bi „zimanekî hêsan“ heye. Dako ew mirovên ko zehmetî di zanîne de hene û naverokên ne sade baş tînegihin, naverokên wan baş tîbigihin.

Ez spasiya nivîsgeha eyaletê ji bo civakê, gencatî û xemxwariya Rheinland-Pfalz dikim ji bo derxistina vê berhevokê. Ev xizmeteke giring e, ji bo mirovên seqet û paşmaya wan koçber ye hin bi hin mafên xwe bi dest xwe ve bînin.

Sabine Bätzing-Lichtenthäler

*Ministerin für Soziales, Arbeit, Gesundheit und Demografie des Landes Rheinland-Pfalz
(Wezîra ji bo civakê, kar, tendurustî û gelhe (demografi) ya eyaleta Rheinland-Pfalz)*

XWENDEVANA/Ê XWEŞTIVÎ,



hemwelatîyê mê ên biyanî têkîlatîyêk mezin ji bo serfiraziya aboriya Rheinland-Pfalz bi kar tînin û bi çandên xwe yên cuda cuda ji bo welatê me dewlemendîyek nişan dikin.

Li Rheinland-Pfalz ji sedî 10,9 mirov ji welatên cuda cuda ji vê cîhanê dijîn. Nezîkî nivê wan ji welatên Yekgirtîya Ewrûpa ye, her çarîkek jî hemwelatîyê din yên Ewrûpî ne.

Di bernama hikûmeta tevghîhanî ya Rheinland-Pfalzê da, koçberî ji bo pêşerojê jî wek bextyarîyek ji bo pêşveçûna welatê me tê nîşan danê. Pêkvejiyana mirovan ji çandên ciyawaz divê bi berfirehî di civaka me de pêk were. Ew jî erkêk navendî ya welat û civaka me ye.

Ji bo gihîştina vê armancî, divê mirovên koçber li ser pêzanînan li ser bingehên çavdêriya yasayî û nûnertiya xemxwariyê agahdar bin. Ji ber ku, yasayê çavdêriyê ji bo pêkvejiyanê û hevkarîyê di civakê de gelek giring e.

Nivîsgeha welat ji bo civakê, gencatî û xemxwariyê xwest vê rêberîya pêzanînan bo mafê çavdêriyêji bo koçberan weşand. Ev berhevok pêzanînan li ser bingehên çavdêriya yasayî û nûnertiya xemxwariyê bi zîmanekî hêsan pêşkêş dike.

Ez gelek kêfxweşim ku, dikarim wan pêzanînan bighêjînim destên we.

Detlef Placzek

*Präsident des Landesamtes für Soziales, Jugend und Versorgung Rheinland-Pfalz
(Serokê nivîsgeha welat ya civakî, gencatî û xemxwariyê li eyaleta Rheinland-Pfalz)*

NAVEROK

I. ÇAVDÊRÎYA YASAYÎ	7
Sê hingavê berbi çavdêriya yasayî	8
Beşên erkan yê çavdêrvan an jî ya çavdêrvan	10
Kî dikare bibe yê çavdêrvan an jî ya çavdêrvan?	13
Kî barê xerciyê bi xwe ve digire?	14
II. ÇAVDÊRÎYA XEMXWARÎYÊ	15
III. NÛNERTÎYA XEMXWARÎYÊ	16

ÇAVDÊRIYA YASAYÎ

Û DERFETÊN BO XEMXWARIYÊ

Her kes dikare qezayekê derbas bike, bi nexweşiyê giran bikeve an jî derbasî aloziyê giyanî bibe. Ev dikare wisa lê bike, ko bo demê an jî hemî jiyana xwe pêdivî bi alîkariyê, dako jiyana xwe bi ser ve bibe. Ev bo nexweşiyên bi temen ve girêdayî ve jî dixwe.

Di vê rewşê de yek pêdivî dibe, ko nûnertiya dilbijîn û mafê mirovên têkildar bike. Bo nimûne beramberî fermanber, karmend, Bank û bijîjkan.

Li Elmaniya derfetên cuda cuda hene, ka çawa mirov dikare bibe nûnerê têkildar. Ew dikare bo nimûne di rêka nûnertiya xemxwariyê re bête wezîfedarkirin. Bi gelemperî **nûnertiya xemxwariyê** dixwaze çavdêrî li saziyê neyête kirinê. Eger nûnertiya xemxwariyê nehatibe dan, êdî daxwazên wan yê ji bo çavdêriya yasayî di **çavdêriya xemxwariyê** de dikare li ber çav bête danîn.

Mehkema çavdêriyê ya Mehkema îdarî biryarê li ser çavdêriya yasayî dide. Ev tenê pêk tê, dema nûnertiya xemxwariyê nehatibe danê li gor.

Di vê berhevokê de ev hersê têgeh têne şirovekirin:

- I. **ÇAVDÊRIYA YASAYÎ**
(*Rechtliche Betreuung*)
- II. **ÇAVDÊRIYA XEMXWARIYÊ**
(*Betreuungsverfügung*)
- III. **NÛNERTIYA XEMXWARIYÊ**
(*Vorsorgevollmacht*)

I. ÇAVDÊRIYA YASAYÎ

Mirov dikare biryarstendina çavderiya yasayî di pirtuka yasayî ya gelerî de (BGB) bibîne.

Eger mirovek nexweşiyê derûnî an giyanî an hişî û seqetiyê laşî hebe, dikare ji bo çavdêriyê yasayî bête sazkin. Ev tenê wisa dibe, dema ew nema bikaribe karûbarên xwe bi xwe bi rê ve bibe. Di bingehê de, dibe çavdêrî bi erêkirina yê têkildar be, lê dikare jî bêyî derbirîn û erêkirina wî an dijî daxwaza wî biryar bête stendin.

Mehkema Çavdêriyê wê helbet erkan bo yê çavdêrvan an ya çavdêrvan destnîşan bike. Ew erk dê bi yên têkildar re bêne guftûgokirinê.

Yê çavdêrvan an ya çavdêrvan dikare di çarçoveya wan erkan bitinê de bibizav be. Bo nimûne ev erk di çarçoveya rewşa tendurustî û/an jî mewdanî ya mirovê lê têtê nêrîn û belkî jî serederiya di gel fermanberan.

Gelek, gelek ev çavdêrî dikare heft salan berdewam bike, êdî lêpîrsîn dibe, ka ev mirov pêdivî bi çavdêriyê ye an bidawî dibe.

Ji bo hilbijartina yê/an jî ya çavdêrvan daxwazên wî li ber çav têne girtin. Di destpêkê de, wê ew mirov bên xwestin, yên ko wek kesayetî nêzîkî yê têkildar in. Hakima/an ê pişkinînê dike, ka ew mirov wek mirovekî pişpor lê wê astê ye û digunce bo çavdêriyê, ew mirov dikarin berpîrsiyareke bi tewawetî ya wan erkan hilgirin û wan pêkbînin.

Çavdêrvanê yasayî ew in nûnerê yasayî ji bo mirovê yê çavdêrîbar û nûnertiya wî di mehkemê û derveyî mehkemê de jî dike.

Ev ji bo wê ye, ko ne ji bo hilgirtina nûnertiya ye, lê wek pêşkêşkirina alîkariyê ye!

Ji bo mirovên seqet, wek yasayên Peymanên mafê seqetan - YN "UN" ji (Xama 1) «Ew mirov ên ko eve demeke dirêj e ji hêla laş, giyan û hiş ve, di bin kartêkirina wan de ne, ew yên dikarin di gel têkperbûnê bi astengên curbicur re, nehêlin hevkarîyek bi tevayî û kartêker û bi wekhevî di civakê de bikin.»

■ Nexweşiyên Derûnî

Di bin der ew hemî nesaxiyê laşî û nesaxiyên giyanî nerastdar, lê yê têkçûnên giyanî jî ko encama nexweşiyên in an wek kartêkirinên derve tên têgehiştin: Ev dikarin bo nimûne encama kulbûnekê, guherînekê an jî birînekê di mejî de be. Ji bilî wê jî têkçûnên xermaniyên (Xermanî) dikarin di rewşên xeternak de mîna nesaxiyên derûnî li wan bête nerîn.

■ Seqetiya derûnî / Seqetiya fêrbûnê

Yên dikevin bin vê têgehê de, ew in yê astengiyên derûnî jixwevehebûna (Fitrî) û stendî hene. Ew yê di rêyên wan derfetên Kêm hene, ko jiyana xwe bi xwe bi rê ve bibin, wê wek qelsbûna jêhatiyên civakî li qelem bête danê.

■ Seqetiyên Giyanî

Mirov di bin têgeha seqetiya giyanî de weha têdigihe mîna astengiyê berdeyam e, ya ji encama nesaxiyê derûnî çêbûye. Ew astengkirinên hişmendî jî di rêka temenmezînbûnê de (b.n. Xirifandin/ demenz) dikevin bin vê wateyê de.

■ Seqetiyên laşî

Dema şiyên laşî bo xemkişandina rewşa taybet parçeyekî bête hilandin an bi şêweyekî mezin asteng bibe (b.n. li dema berdeyamîya liva neşyanê) wê hingê derfet hene, ew mirov çavdêriya yasayî werbigirin. Mirov ên seqetên laşî tenê dikarin bi daxwaznameyekê çavdêriya yasayî werbigirin.

Sê hingavê berbi çavdêriya yasayî

1. Ragehandin

Dako çavdêriya yasayî bikaribe bête feheskirin û sazkin, yekem tişt ragehandina ji Mehkema çavdêriyê an ji fermanberên çavdêriyê yê navçeyê pêdivî ye. Ev dikarin mirovên têkildar, lê xizmûkarê wan jî, hevalên wan, nasên wan, bijîjk, peymangehên civakî, kamp û nexweşxane jî bikin.

2. Dozajotin

Mehkema çavdêriyê fermanberên çavdêriyê erkdar dike dike, ko lêpîrsînê bikin, gelo ka çavdêrî pêdivî ye an na.

Fermanberê çavdêriyê di gel mirovên têkildar guftûgoyê dike û hinek din re yên pişikdar in û rêmayên pêdivî destnîşan dike. Mehkema Çavdêriyê bi sibeta wê ragehandinekê werdigire. Fermanberên navê mirovên yên dikarin bibin çavdêrvan an çavdêriyê re guncayî dide mehkema çavdêriyê.

Yên roleke watedar di peydakirina çavdêrvanan de dilîzin rapora biryarpêdanê û rapora civakî ne. Fermanberê çavdêriyê ew in yên rapora civakî pêşkêş dikin.

Naveroka vê raporê îfade ne li dor:

- pêdivîbûn û hawîrber vê çavdêriyê
- kesên çavdêrvana/çavdêrvanê
- cure û berdewamiya yê pêdivî alîkariyê ne, b.n., aya ev çavdêrvan tenê ji bo demekê be.

Rapora civakî dê bi mehkemê bête ragehandin.

Rapora biryardanê ya derûnî û belge ji hêla karmendê pispor yê nojdariyê an jî fermanberê tendurustiyê tête nivîsîn. Mehkema çavdêriyê ew e ya biryara daxwaza rapora biryardanê dide.

Erkê hakima çavdêriyê / hakimê çavdêriyê ye, ko kesên têkildar, li dor lênerîna yasayî agahdar bike, ew e xudanê biryarê ye, pêdiviye li wî bi xwe, beriya biryardanê guhdar bike. Wate, derfeta wî mirovî heye, ko careke din bi ferehî li dor biryarê xwe derbibire.

Eger mirovê têkildar bi zimanê Elmanî nizanibe, dê wergervanekê an wergervanekî bênin.

Pêdiviye mirovê têkildar di bingehê de çavdêriyê erê bike, dako êdî bikaribe bête sazkinê. Hinek rewşên awarte jî hene, ko bêyî vîn û daxwaza an li dijî daxwaza yê têkildar dikare pêk were.

3. Biryarstendin

Hakima / hakimê li Mehkema çavdêriyê li ser bingeha rapora biryardanê û guhdarîkirinê li dor çavdêriyê biryarê distîne.

Biryarstendin li ser saziya çavdêriyekê pêdiviye di rêka biryareke nivîskî be.

Ev biryar digihe her hevpişkekî. Zêdebarî wê ev biryar ji fermanberên Çavdêriyê re jî biçe. Di wê biryarê de, diyar dibe kî çavdêrvana/ê yê têkildar be, ev mirov wê erkên wî çi bin û çi desthilata wî heye.

Mafê her mirovekî û her saziyekê heye, li ber biryarê rabe "gilîh" bike.

Beşên erkan yê çavdêrvan an jî ya çavdêrvan

Xizmetguzariya tendurustiyê

Xizmetguzariya tendurustiyê hemî rêmayên di hemî rewşan de li derûdora tendurustiya mirovekî bi xwe ve digire. Eger mirovekî çavdêrî lê tê kirinê bi xwe dikare serederiyê di gel fikarên xwe bike, ew bi tinê biryara xwe dide. Di rewşên din de pêdiviyê ya çavdêrvan/ yê çavdêrvan biryarê bistîne.

Di nav de hin tiştên din hene:

- birêvebirin û pejirandin ji bo
 - tevdirên bi terapiyê
 - pişkinîna xemxwariyê
 - emeliyatê û Garantîkirinê ji
- pejirandina pişkinînên nojdariyê, Emeliyat û tevdirên çareseriyê
- peydakirina çareseriyê nojdarî
- erkên pêzanînan yê bijjikan (nehênî beramber yê çavdêrvan)

Pêdivî ye ya çavdêrvan an jî yê çavdêrvan herdem bi bijjikan, nexweşxaniyan, xizmetkarên çavdêriyê û saziyên di ware tendurustiyê de di têkiliyê de bin û bi wan re li dor hemî rewşên tendurustiyê di guftûgoyê de be.

Xema Sermiyan

Tê wateya ew hemî berjewendiyê sermiyanî yê mirovê lê tete çavdêriyê birêkûpêk dike û diparêze.

Tiştê pê bend b.n.:

- birêvebirina hesabê bankê yê mirovê lê tete çavdêrî
- fehsa hatin û danê
- destnîşankirin, cihbicihkirin û daxwazkirina hatinê xizmetguzariyên civakî
- lêhilgirtina kêmkirin û erzankirinê.

Nûnertî li beramber fermanberan

Ya çavdêrvan / yê çavdêrvan ji bo mirovê lê têtê çavdêriyê di çarçoveya bazina erkên xwe de jî daxwaznameyan bo fermanberan rêdike. Zêdebarî wê di nav erkên wî/ê de hemî cureyên bihevguherîna nivîsînê ne.

Karûbarên yasayî yên mirovên biyanî dikarin bibin di nav bazina erkên ya çavdêrvan û yê çavdêrvan.

Karûbarê Postê

Ev bazina erkan liserkarkirina postê ya mirovê lê têtê çavdêrî bi xwe ve digire. Ev bazina erkan tenê pêdivî ye, dema posta mirovê têkildar nima bikaribe bi serê xwe kar bike.

Mafê biryardariyeke manê

Ya Çavdêrvan an jî yê çavdêrvan mecbûr e li gorana yasaya qeydkirinê ya eyaletên federal erkên qeydkirin-rakirin- û guhestina qeydê li nivîsgeha qeydkirinê qeyd bike. Ya çavdêrvan/ yê çavdêrvan dikare ji bo a / yê lê têtê lênerîn peymanên kirê girêde û berde. Ev destpêşkerî jî rakirina azadiyê li ser bicihbûnên mirovê lê têtê çavdêrî e di bazina erkan de yê „destnîşankirina manê“ himbez dîke.

Biryardan li dor man bicihkirinê mecbûr e, eger derfet hebe bi wî mirovê lê têtê lènênêrîn pêk ve biryarê bête stendin.

Cihê Manê

Di bin mercên destnîşankirî der (b.n. eger metirsiyeke gelekî zor hebe ko ziyane li tendurustiyê bête kirinê an jî metirsiya ji xwekuştinê hebe) yê lê têtê çavdêrî têxin saziyeke dergêh lê bê girtin an jî di beşekî girtî di nexweşxanekê de an jî wî têxin xaniyên çavdêriya pîran.

Li dor pêdivbûna têxistina cihekî girtî de mehkema çavdêriyê biryarê distîne, di pey ko ya çavdêrvan an yê çavdêrvan ji bo wisa rewş daxwaznameya bicihkirinê bike.

Tevdîrên yên nêzikî cihmanê

Ev hemî tevdîrên rêlêgiriye ne, ko ya/yê lê têtê çavdêrvanê di rêka amûrên mîkanîkî, derman û an jî bo şeweyekî din di demeke dirêj de an jî li demdirêjyêkê an birêkûpêk azadî jê bête wergirtin (b.n. Têla text, qarîş li ser text an kursî, dest û ling girêdan, ode kilîtikirin, dermanê ko pê têtê ihêminkirin bixwazin).

Di van rewşan de jî mevbûriye erêkirina mehkemeyê hebe, eger mirovê lê têtê çavdêrîkirin bi xwe nikaribe erê bike.

Karûbarên malê

Di çarçoveya bazina erkan de, yê/ya çavdêrvan hayjêhebûna bo nimûne bêdawîanîn an jî domandina peymanên kirêdariyê ne. Zêdebarî wê jî yê/ya lê têtê çavdêrî dikare biryara veguhestina bo mala guhdanê guncayî, birrîna peymanê kirêdariyê bide.

Mirovê lê têtê çavdêrvan dikare di hemî daxwaziyan wî de li derdora babeta xanî alîkariyê werbigire. Bo nimûne:

- pirsên sermiyaniya malê
(kirê û xerciya sereber re)
- têkilîgirêdan bi xudanê xanî re an jî bi nivîsgeha xanî re
- têkilîgirêdan bi cihên elektîrkê re.

Ya/yê çavdêrvan, dikare peymanê kirêdariyê bidawî bîne bi mercekî, ko beriya wê demê pejirandina mehkemê anîbe.

Kî dikare bibe yê çavdêrvan an jî ya çavdêrvan?

1. Çavdêriya bidilxwazî

Çavdêrvana an jî çavdêrvanê bidilxwazî Çavdêriyê ne wek pîşe birê ve dibin. Tê wateya, ko ew ji bo çavdêrvaniya xwe pera nastînin, lê ew ji bo karê lîrînêrîna xwe salê qerebokirina xerciya xwe werdigirin.

Hinek yasayên giring hene ji bo rêvebirina çavdêriyê. Di nav wan de pêzanînên baş bi zimanê elmanî û nasîna sîstema elmanî- ya yasayî- û civakî.

Li dor pejirandina mirova/mirovê ya çavdêrvan an yê çavdêrvan ê dilxwazî ew li ber çav tê danîn, ewa, ewê wekû kes nêzîkî wî mirovê têkildar in û di wê rewşê de ne, ko dikarin karê çavdêrîtiyê bi rê ve bibin. Derfeta destpêkê bi endamên malbatê ye an ew mirovên ko ji dorûberên civakî yê wî mirovê têkildar tîn. Yê karîna ye çavdêrvan an ya çavdêrvan pişkinîn dike, fermanberên çavdêriyê ne û mehkema çavdêriyê biryarê dide.

Fermanberên çavdêriyê û komeleyên çavdêriyê ew in yên alîkariya pêdivî didin ya çavdêrvan û yê çavdêrvanê dilxwaz û yê di gel wan dimîne.

Komeleya çavdêriyê ew e jî ji bo dibistkirin, fêrkirin û biqalîtekirina ya çavdêrvan an yê lîrînêrîna dilxwaz berpîrsiyar e.

2. Çavdêriya demdirêj

Ya pişeyê çavdêriyê an yê pişeyê çavdêriyê ew mirov e, yê/ya li Elmaniya çavdêriya fermî di çarçoveya yasayeke fermî bazirganî de dixebite.

Komeleyên çavdêriyê kar didin ya pişeyê çavdêriyê/yê pişeyê çavdêriyê, yê li dezgeha di xebatê de ne. Ji van yên wisa re êdî tê gotin çavdêrvanê komelê.

Pêdiviyê pişê û çavdêrvanê komelê xwedan pisporiyeke guncayî be û di wê asteyê de be, ji bo yê têkildar alîkariya yasayî ta steya daxwazkirî pêşkêş bike. Pişeyekî fêrkirinê bi wateya yasaya pişeyê fêrkirinê an jî xwendinekê tune ye.

Kî barê xerciyê bi xwe ve digire?

Di bingehe de, ew mirova an mirovê têkildar bixwe xerciya çavdêrî radihêjîyê. Ew xercî, xerciyên mehkemê ne an qerebokirina ji bo karê pişeyî yê ya çavdêrvan û yê çavdêrvan û qerebokirinê ji bo ya bilxwazî çavdêrvan / yê bilxwazî çavdêrvan.

Eger mirovek hatina wî nebe an tenê hatina wî hindik be, nivîsgeha yasayî per û xerciya pêdivî wê ji xezîneya dewletê dide. Sermiyanê ko zêdeyî 5.000 Euro be, pêdiviyê ji bo xerciya çavdêriyê bête danê. Eger sermiyanê amade ji 5.000 EURO derbas bibe, pêdiviyê yê têkildar ji bo qerberokirina xerciya pişeyî ji bo çavdêrîtiya dilxwazê bi xwe bidin.

Ev pişkinîn wê di rêka mehkema çavdêriyê re cih bi cih dibe.

Mehkema çavdêriyê di bin hinek mercan de, salên gomek xercî distîne. Ji vê re jî dibêjin serederiyê – û xerciya mehkemê.

Ji bo xerciya mehkemê ya serederiyê sermiyanê goma azad ji 25.000 Euro, dibe. Kî ew sermiyan zêdebarî sermiyanê goma azad hebe, mecbûr e ji bo xerciyê an raporên bijjîkên pispore bi xwe pereyan bide.

II. ÇAVDÊRIYA XEMXWARIYÊ

Çavdêriya xemxwariyê tevdîrêk pêşgirtiyê xemxwariyê ye.

Di gel biryara çavdêriya xemxwariyê, ew dikare beriya çavdêriyê bête destnîşan bik, kî weke ya çavdêrvan an jî yê çavdêrvan bête daxwazkirinê, û pêdiviyê li gorî daxwazên ya/yê çavdêrvan xwe eyar bike.

Mirov dikare berwext jî ji hinekan re wek ya/yê çavdêrvan re bibêje na.

Xemxwariya çavdêriyê derfetê dide, hêvî li gor wê nêrîna serederiya çavdêriyê, bazinê erkan, şabaşî bo kesê siyem, fermana bo dermankirina nojdarî û bihkirina di yek ji serederiyên çavdêriyê de bêne derbirîn.

Weha ji ber wê yekê giring e, di van rewşan de, ko mehkema çavdêriyê çavdêriyekê birêk bixe û mirovê têkildar ne li wê astê be ko pêk bîne û daxwazên xwe derbibire. Bi çavdêriya xemxwariyê re dê kesek bête destnîşankirin, ew yê pêdiviyê çavdêriyê bike. Di vê rewşê dikare çend kes bobazinên erkan yê cuda bêne pêşniyarkirinê an hinek kes destnîşan bibin, ew yên qet nedibû bo çavdêriyê bêne daxwazkirinê.

Eger bo mehkema çavdêriyê çavdêriya xemxwariyê nas be, gerek di pîrensîpê biryarstendinê de li ber çavan bête girtinê.

Mehkema çavdêriyê erkdar e, pişkinîna mirovê têne pêşniyarkirinê û hazirîya wan bo karkirina çavdêriyan baweriyê pê bidin.

Eger xemxwariya çavdêriyê ne berdest be, mehkema çavdêriyê li gor pêdivîbûnê li mirovekî guncayî digere.

III. NÛNERTIYA XEMXWARIYÊ

Ev lihevhatineke kesayetî yasayî ye di navbera mirovekê/î, yê nûnertînameyê dide (di navbera nûnertiyê/danera nûnertiyê) û mirovekê/î yê pêbaweriyê vê nûnertînameyê werdigire (ya nûnertî pêdan/yê nûnertî pêdan).

Di yek xemxwariya nûnertîpêdanê de teqez bike, ew kî ne yên pêdiviyê biryarên cihgiriyên bistênin.

Ev nûnertî xwedan awayekî hejêheyî ye û pêdivî ye yekem car were bikaranînê, eger ya nûnertîdaner/yê nûnertîdaner ew karûbarê xwe yê yasayî êdî nema bitinê bikaribe an bixwaze pêk bîne.

Ya nûnertîdaner /yê nûnertîdaner pêdiviya ta dema bo dana nûnertîdanê salên xwe tije kiribin û karrêvebinê hebe.

**Her mirovek dikare serbixwe nûnertiya xemxwariyê çêbike.
Ew derfet heye li vir jî reng an jî pêşniyazên derbirînan bikar bihên.**

**Rêxistin û saziyên çavdêriyê û karmendên çavdêriyê yên
xweçihî dikarin bi şêweyekî dûr û dirêj şêwirmendiya
nûnertiya xemxwariyê bike.**

**Ew derfet heye, lê nebi mecbûrî tê xwestin, ko nivîskarê edaletê
li dema danîna nûnertiyê beşdar bike.**

Nûnertiya xemxwariyê dikare saziyê ji çavdêriyêkê di rêka mehkemeya çavdêriyê biparêze.

Ya /yê nûnertîspêrdar dikare yekser nûnertînamê bêy bîrokratiyê û kartêkirineke yasayî ji bo ya nûnertîdanera/ nûnertîdanerê serederiyê bike.

Saziyên peredanê zorbeyî caran tenê nûnertînameyan li ser formularên banka xwe an nûnertînameyên yên belgekirî ji hêla nivîsgehên mehkemeyan pêbawer dibin.

Ew pêdivî formên taybet nîn in. Eger bi nivîskî bêne ragehandin- ev helbet tête pêşniyarîkirin-pêdiviyê jî hun bi kesayetî (şexsî) imze bikin.

Bawerîpêdan û belgekirina nûnertînameyê di bingeha yasayîya xwe de, pêdivî bi nivîsgerê mehkemê nîne, lê tête pêşniyarkirinê, eger ew nûnertîname bo nimûne ji bo xaniyan an jî qetê erdan be, ko ew kar bibe.

Di gel **Bawerîpêdana** nûnertînameyê xemxwariyê karmendekî çavdêriyê an jî nivîsgerê mehkemê, teqez dike, ko yê ew nivîsiye, ew yê imzeya xwe jî bi rastî bi destê xwe li bin daye.

Belgekirina nûnertînameyekê di rêya nivîsgerê mehkemê re ji bo firoşgehan li gor yasayê pêdivî ye, wek nimûne:

- kirîn û firotina qetên zeviyan an jî xaniyan
- bazirganî- û karsaziyên yasayî civakî, bo nimûne firotina kargehan, guherîna forma yasayî
- stendina mîrat
- bidawîhatina deynên serfvanan.

Karmendên çavdêriyê destûr bi wan re heye, nûnertiya xemxwariyê bi bawerîpêdanê bidin. Ewe ye di yasaya karmendên çavdêriyê li ser asteya welatê federal de wek hev hatiye rêkxistin.

Karmendên Çavdêriyê ew in, lê belê **ne** destûrdayî ne, belgeameyan destnîşan bikin.



ÇAVDÊRÎYA YASAYÎ



Rheinland-Pfalz

LANDESAMT FÜR SOZIALES,
JUGEND UND VERSORGUNG

Rheinallee 97-101
55118 Mainz

Telefon 06131 967-260
www.lsjv.rlp.de

KURDISCH

Gihandin di rêka: